

GERYANEK LI DORA “BELENGAZÎ”YÊ: JANA GEL

I.

Edebîyat di avakirina bîreke neteweyî de navgîneke xurt e ku pê qîseta ziman û rabirdûya xwe dereve dike. Edebîyata me¹, ku edebîyateke kulek e, ji çarmedora xwe ve seraqet derb xwarine û li ser destên dagirkerên xwe teşe girtîye. Li gor Helîm Yûsiv, gava ku mirov li edebîyata kurdî ya vê sedsala dawîn dinihêre, yekem tiştê ku bala me dikêşe ew e ku edebîyata me bi temamî ji nav kûrahîya sîyasetê derketîye û her wisa jî heta qirikê di nav sîyasetê de maye, sedemên vê jî paşxaneya dîrokî, cografî, civakî û sîyasî ne ku rewşa kurdan û parçebûna Kurdistanê ya nav çar dewletan bi xwe re anîbû².

Gregory Jusdanis îddia dike ku edebîyat di nav hemû cureyên hunerî de cureya herî xurt e ku di pêkhatina netewebûnê de beşdarî lê dike. Edebîyat wekî neynika nasnameyeke kolektîf xizmetguzariyê dike û ji layekî ve rojnivîska neteweyekê ye ku çîroka wê ya rabirdû, niha û dahatûyê vedibêje. Lewma çanda edebîyatê ji bo wan civatên etnîk pêdawîstîyeke jêner e ku pê dixwazin yekîtîya xwe ya neteweyî qewîntir bikin û bidin nîşan ku va ye amade ne bo modernîyê (bi derengmayînî).³ Kêşeyeke din jî ev e ku ka gelo me edebîyateke neteweyî heye? Me zimanek, alfabeyek, dewletek hevbeş nîn e û di ser re jî em edebîyata xwe û edebîyata cîhanê bi zimanê serdestên xwe hîn dibin

* Xwendekarê lîsansê yê Beşa Ziman û Edebîyata Kurdî ya Zanîngeha Mardin Artukluyê.

1 Di vir û temamê nivîsê de, mebest ji *edebîyata me*, edebîyata kurdî ya modern e.

2 Yusiv, Helîm (2011), *Romana Kurdî*, Weş. Ronahî, Dîyarbekir, r.10.

3 Jusdanis, Gregory (1998), *Gecikmiş Modernlik ve Estetik Kültür*, Wer. Tuncay Birkan, Weş. Metis, Stenbol, rr. 68-76.

û tew dirûvên hevokên me jî bi mentîqa zimanê serdestên me ne. Gelek pisporên vî karî di wê bîr û bawerîyê de ne ku edebîyateke neteweyî bi zimanekî neteweyî anku bi zimanekî hevbeş gengaz e. Remezan Alan edebîyata neteweyî li ser du paran dike, a) fikren: yanî edebîyata ku neteweyekî derdixê pêş, endîşe, utopya û daxwazên wî derdixê pêş; ger ew neteweyeke bindest be, çareserîyê derdixê pêş, an jî ew netewe ji bo pêserojê, ji bo rabirdûyê xwedîyê texayuleke çawa ye..., b) ziman: zimanê aîdî miletekî ku bizatîhî tişteki neteweyî ye ji bo cemaetekê⁴.

Nivîskarên destpêka edebîyata kurdî ya hevçerx, ku bi erkeke neteweyî rabûne û da ku kela dilê xwe bo karesat û qirkirinên li wan bûyî hinkekî jî kêmbikin, qala belengazî, hejarî, mêvanperwerî, bêgunehî, bêtifaqî û hwd. kirine. Edebîyata me ji vê vegotinê ne bêpar e û her xwestîye ku bi afirînerîya xwe têkeve nava têkoşan û doza azadîya welatê xwe. Bi vî hawî, çêdibe ku em edebîyata xwe ya vê qonaxê di nav edebîyateke mîltan de bi nav û nîşan bikin.

Bi vê nivîsê re ez ê hewl bidim ku geryanekê li dora *belengazî*⁵ (mebest jê *Jana Gela Îbrahîm Ehmed* e) bigerînin. Di ber re jî ez ê ji xwe re qala romana kurdî, Îbrahîm Ehmed û jîyan û berhemdarîya wî, xasma jî romana wî ya *Jana Gelê* bikim. Helbet min çavpêketinek jî li ser gotinên wî yê derbarê *Jana Gelê* de heye, ku ka gelo Îbrahîm Ehmed li ser *Jana Gelê* di nav dubendîyekê de ye yan na.

II.

Roman çûçîka malê ye û çer ku çûçîkên malê bi delalî û nazenînî radibin, hema wer bi hemd û halmîn gav dane xwe; li hengameya bajêrguh dêraye, bûye xurênîya paleyan, di destên zarokan de bûye loqim û nanik, bi dayîkên Kurdistanî re nan li tenûrê xistîye, li ber çêmasî girtine, bi dizekên bajêr re kevok firandine, bûye gayê cot, li ber tavê seridîye û hê jî li çarnikalê me wekî gêrikan gêrdibe û em jî tê de gêjdibin. Behseke berbelav e ku romana îro ro jî nav kanîyên Ewropayê, di destpêka sedsala 17an de bi *Don Quixoteê* der bûye, lê yê ku bere-

4 Serfiraz, M. -Yeşilmen D.- Kurt Ş. (2014), “Bi Remezan Alan re li ser Sînorên Wêjeya Kurdî Hevpeyvîn”, *Wêje û Rexne*, hej. 3, r. 140.

5 Jixwe Îbrahîm Ehmed jî di hevpeyvîna xwe de, ku Mehmed Uzun pê re kiriye, heman tiştî destnîşan dike: “Di nivîsînê de, rindî û xweşî armanca min e. Bûyerên *rasteqîn* bingehên eserên min in. Fedakarî, xurtî, *belengazî*, *bindestî* û xebata qehremanî ya mîletê me rêberên nivîsînê min in, *xirabî û nerindî* ji xebatên min dûr in. Bi bawerîya min, encam û serketina eserek divê di *xizmeta* gel de be, ji bo wan be, rast be (r. 337, *italik yên min in*).” Dû re jî dibêje: “Edebîyat û sîyaset divê bi hev re bimeşe (r. 337).” Bnr. *Antolojîya Edebîyata Kurdî*, Amad. Mehmed Uzun (1995), Weş. Tûm Zamanlar, Stenbol.

vajîyê vê jî îddia dikin ne kê m in. Herçend ku hin kes îddia dikin ku Ere b Şemo romana xwe ya *Şivanê Kurmanca* serê ewil bi rûsî nivîsîye û paşê wergerandîye kurdî jî, em dikarin wê wekî romana kurdî ya yekem hesêb bikin, ji ber ku di sala 1935an de bi kurdî çap bûye. Lê Îbrahîm Seydo Aydogan di gotûbêja xwe de, ku di 23yê Adara 2013an de li Amedê çêdibe, îddia dike ku romana kurdî ya yekem a Ehmedê Xanî ye, ku herhal mebest ji vê Mem û Zîn e, û wiha dibêje: “Herçî Ehmedê Xanî ye, ji xeynî avakirina romanêke manzûm ku ez jê re dibêjim yekem romana kurdî ye, hin karên din jî kirine. Ez dibêjim roman, ji ber ku roman bi forma xwe ve nabe roman.”⁶ Helbet ev îddiayeke derî nivîsa me ye û hêjayî nîqaşê ye.

Romana me û romana cîhanê jî di nav de, wek formeke edebî, bêhtir di nav mêran de ji xwe re cihekî peyda kiriye. Ev kêmnivîsîna jinan bi ya me ji zîrektiyê wêdetir bi fonksîyana wê ya nava civakê re girêdayî ye. “Jin, jina malê, ya kevanî, ku li zarokên mêrê xwe miqate ye, ku stûna malê ye” û rabe bibe şêr dê çi be, ku nebe dê çi be, ma qey dê biçê berhemên Virginia Woolf bixwîne? Erê, hema ji ber vê hindê Georg Lukacs di gotina xwe de ne neheq e, hinga ku dibêje, roman şêwaza hunerî ya kemilîna mêrane ye: ev tê wê wateyê ku, gava ku em bi awirtêdaneke objektîf li giştîtiya dinyaya romanê dinihêrin ev kêmasîyek e, gava ku hewldaneke subjektîf jî çêdibe wateya sertewênîyê dide⁷.

Li gor Haşim Ahmedzade, kêşeya herî xurt a cîhana romanên kurdî kêşeya nasnameyê ye ku bi têra xwe polîtîze bûye⁸, romana kurdî piranî daxwaz û hesreta kurdan a ji bo nasnameyek azad û serbixwe vedibêje⁹, lê di romana kurdî de sînoren netewî hê jî hene û babetên serekî yên romana kurdî bi nasnameya netewî re nêzîkbûna xwe ya kûr dide ber çavan, lewma romana kurdî di girêdana meseleyên netewî bi yên gerdûnî de biserketî nebûye¹⁰. Ev serneketin jî kê m zêde ji ber sedemên sîyasî, cografî, çandî yên kurdan in û belkî jî ya herî girîng, derzek e û hê jî necebirîye di ruhîyeta kurdan de.

6 Ev gotûbêj ji aliyê *Wêje û Rexneyê* ve pêk hatîye û di hejmara sêyem a vê kovarê de wekî nivîskî hatîye belavkirin. Bnr. Aydogan, “Romana Kurdî û Rexne û Ziman”, 2014, r. 37. Aydogan dîsa, di heman nivîsa xwe de îddia dike ku di romana kurdî de bîr, bîra giştî, bîra şexsî, derûnî tune ye û hemû pirsgirêka wê jî bîr e (35).

7 Georg Lukacs, *Roman Kurami*, Weş. Metis, Wer. Cem Soydemir, Stenbol, 2013, r. 78.

8 Ahmedzade, Haşim (2004), *Ulus ve Roman*, Wer. Azad Zana Gündoğan, Weş. Pêri, Stenbo, r. 357.

9 Ahmedzade, Haşim (2011), “Di romana kurdî de nişaneyên bêdewletbûnê”, *Romana Kurdî û Nasname*, Wer. Fahrîye Adsay, Weş. Avesta, Stenbol, r. 59.

10 Hb., “Li pey romana kurdî ya ji me re vedibêje ku kurd kî ne”, r. 139.

Romannûsên ewil xwestine nasnameyeke neteweyî ava bikin û romanên xwe bêtir bi bangeşiyê, yeklayanîya karakteran, hişmendîyeke giştî ya bindestîyê saz kirine û xema civakê di ser şexsîbûnê re girtine, lewma ji alîyê avakirina derûnîya karakteran ve ketine nava dubendîyan û tê de qala xwe (ne ya karakteran), qala jan û xwesteka gelê xwe kirine. Gunehê xwe bi xwe anîne û wer fahm kirine ku qey dê bi vê gunehpêanîne xelk jî gunehê xwe bi wan bînin û dê bibêjine wan “aha, a ji te re azadîya te û gelê te, aha, a ji te re axa te û Kurdistanana te”, lê helbet ev tenê xewn û xeyaleke şêrîn bû bo wan, ji bo wê pêk nehat.

Roman berîya her tiştî meseleya zimên e, zimanek qise dike û me ber bi derfet û delîveyên dûredest û nebînayî ve dibe, dibeze û dibeze û dibeze. Û ya ku romanê ji nezmê vediqetîne jî ev e, ew her diaxive û em jî wekî xwendevanekî dilsoz her û her guhdarî dikin.

III.

Îbrahîm Ehmedê ku bêhtir bi sîyasetmedarîya xwe tê nasîn, li ser edebîyatê jî birek xebat kirine. Ehmed di sala 1914an de li Silêmanîyê ji dayîk dibe. Da ku bikare kovareke kurdî derxîne, di sala 1937an de ji Zankoya Bexdayê wekî parêzer derdiçe (wê gavê ji bo derxistina kovaran parêzerek hewce dikir) û di navbera salên 1942 û 1944an de li Kurdistanana Iraqê hakimtî dike. Di sala 1944an de li Kurdistanana Iraqê dibe berpirsê şaxa J.K.yê. Di 1947an de tevî PDKê dibe. Di sala 1964an de, ji ber ku bi Mela Mistefa Barzanî re li hev nake, ji partîyê vediqete, diçe Londonê û heta mirina xwe (2000) li wir dimîne.

Îbrahîm Ehmed di navbera salên 1939 û 1949an de li gel ‘Elaeddîn Seccadî kovara *Gelawêjê* derdixîne. Gotar, kurteçîrok, helbest û wergerên wî yên destpêkê di vê kovarê de belav dibin. Ev kovar bi dewlemendîya nivîs û nivîskarên xwe ve reng û dengêkî nû li edebîyata kurdî ya Başûr zêde kir. Di navbera salên 1949-1956an de *Rizgarîyê*, ku kovara PDKê ye, belav dike¹¹. Di sala 1959an de îmtîyaza rojnameyeke kurdî-erebî ya bi navê *Xebat* (El-Nîdal) werdigire û 462 hejmar belav dike. Piştî îmtîyaza rojnameyeke kurdî ya bi navê *Kurdistan* werdigire û *Xebat* bi giştî dibe erebî¹².

11 Parilti, Abidin- Galipi Özlem (2010), “Îbrahîm Ehmed”, *Kürt Romanı Okuma Klavuzu*, Weş. Sel, Stenbol, r. 35.

12 Ehmed, Îbrahîm (2008), “Pêşgotin”, *Janî Gel*, Tîpguh. Zana Sebrî, Weş. Komal, Stembol, r. 17.

Îbrahîm Ehmed di hevpeyvîna xwe de dîyar dike ku gelek nivîsarên wî, di kovara *Hawarê* de bi navên curbecur hene¹³. Newşîrwan Mistefa di pêşgotina xwe de dîyar dike ku, dîyartirîn berhema Ehmed a bi navê “Yadîgar û Hîwa” cara pêşîn bi navê “Yadîgar û Dildarî”, û bi îmzeya (M) û pêşgotinekî bi îmzeya (S) di hejmareke kovara *Hawarê* de, di sala 1933yan de hatiye belavkirin¹⁴. Lê Mistefa di derbarê navê nivîsê de agahdariyeke şaş dide û xuya ye ku wî bi çavê serê xwe ew nivîs nedîtîye. Îbrahîm Ehmed bi navê M... û îmzeya S ne “Yadîgar û Dildarî” lêbelê “Hîwa û Dildarî” nivîsiye¹⁵. Ev berhema wî yekem berhema pêşîn e ku li ber destê me ye.

Ehmed di dema xwe de hindêk berhemên xwe bê îmze, hindêk bi îmzeya Nîqabdarê Sîyapoş û hindêk jî bi îmzeya Sîyapoş belav kirine. Di helbestên xwe yên evîni û dilsozî yên bînav, çîrokên wî û babetên wergerandiye bi navê Bile, (H.L.B.), (A.A) û (N.A) yan jî bînav belav kiriye¹⁶. Jixwe Îbrahîm Ehmed di 1969an de beşeke ewil a *Jana Gelê* bi navê H.L.B. di kovara *Rizgarîyê* de belav dike¹⁷.

Kemal Fuad (1971) di “Pêşgotin”ê de dîyar dike ku, Îbrahîm Ehmed, *Li Wolatê Qaremanan* (1942), *Xazê* (1943), *Kwêrewî* (1944), *Kerelotîyê Menûçer* (1945), ku kurteçîrok in; *Berew Ronakî* (1945), ku nesir e û *Dwa Tîrî Kewan* (1949), ku helbest e, nivîsîne (9-10). Lê Pariltî û Galip çend berhemên wekî *Yadgarî Lawan* (1933, kurteçîrok), *Bawîk û Kur* (kurteçîrok), *Pirseş Şehîd* (1980, çîrok), *Dirk û Gul* (1991, roman) jî lê zêde dikin¹⁸. Feqî Huseyn jî dîyar dike ku berhemên ku ewî bi dest xistine sê roman, şeş çîrok, kovarek û gelek helbest in¹⁹. Çîrokên me nivîsandî jî şeş heft heb in, dê mebest ji kovarê jî *Gelawêj* be, lê gelo ew romana sêyem a ku qal dike kîjan e? Îbrahîm Ehmed digel nameyeke bi sernavê “Çend gotin li ser vê romanê”, beşa ewil a *Jana Gelê* jî ji *Rizgarîyê* re dişîne. Ehmed di vê nameyê de aşkere dike ku, wî romaneke din jî di sala 1934an de nivîsiye, lê li gor bawerîya wî hê wextê weşandina wê nehatiye (195). Lê ya ecêb jî ev e ku Îbrahîm Ehmed di hevpeyvî-

13 *Antolojîya Edebîyata Kurdî*, r. 331.

14 Hb, r. 10.

15 Bnr. M..., “Hîwa û Dildarî”, *Hawar*, Cild 1, hej. 19, Amad. F. Cewerî (1998), Weş. Nûdem, Stockholm, rr. 392-393.

16 Ehmed, Îbrahîm, *Janî Gel*, r. 10.

17 Ehmed, Îbrahîm(2007), *Jana Gel*, Wer. Zîya Avci, Weş. Lîs, Dîyarbekir, r. 195. Ji vir û pê ve, hemû jêgirên romanê ji vê çapê ne.

18 Pariltî-Galip, r. 35.

19 Huseyn, Feqî (2001), “Îbrahîm Ehmed”, *Jîyana Rewşen*, hj. 50, Adar 2001, r. 7.

na xwe de dibêje, “Kitêba min a yekemîn Janî Gel e²⁰.” Helbet ez ê bi dû nekevim bê ka gotinên Ehmed çend rast in, lê heke ev rast be, nexwe me tarîxa edebîyata kurdî hê nenivîsîye. Û ma çêdibe ku ew romana sêyem a ku Feqî Huseyn qal dike, hema ev roman be? Nizanim.

Bi vî awayî, ez ê bi giştî berê xwe bidim *Jana Gelê*, ku ev roman jî di sala 1972yan de çap bûye.

IV.

Çend beşên *Jana Gel* cara pêşîn di 1969an de li Silêmanîyê, di kovara *Rizgarîyê* de tên belavkirin. Wekî kitêb jî di 1972yan de derfet çêdibe ku bê çapkirin. Îbrahîm Ehmed bi şanênavê H.L.B. nameyekê (20.06.1969) digel beşeke *Jana Gelê* ji *Rizgarîyê* re dişîne. Ehmed di nameya xwe de dîyar dike ku wî di Nîsana 1956an de dest bi nivîsandina vê romanê kiriye. Lê ji ber rejîma kevneperest a Nûrî Seîd romana xwe sansur kiriye, navê şexs û cihan veşartîye, wextê wê aşkere nekiriye. Di vê hîne re behsa wefata Şêx Mehmûdê Berzencî belav dibe, piştî hikûmeta Îraqê rewşa awarte radigihîne, nahêle gel dakeve qadan, xelkê didin girtin, êşkenceyê li wan dikin. Îbrahîm Ehmed jî wê çaxê tê girtin. Ji ber girtina wî, malbata wî hemû nivîs û kitêbên wî yan veşartin an jî li çendîn malan belav kirin. Piştî ku zilm û zorî piçek sist dibin, Ehmed bi pey berhemên xwe dikeve lê hindek berhemên xwe peyda nake, çimkî gelek malî ji tirsê zilm û zordariyê kitêbên wî şewitandin. Ehmed dibêje qey *Jana Gel* jî bi vî awayî hatiye şewitandin, lewma hewl dide ku romanê ji nû ve binivîse, lê nikare. Rojekê, di 1967an de, ji nişkê ve hevrêyekî wî baholek kitêb jê re tîne, ku *Jana Gel* jî di nav de ye (195). Heta vir her tişt baş û xweş e, tu kêşe û arîşe nîn e, lê Îbrahîm Ehmed di hevpeyvîna xwe de li ser wext û nivîsandina *Jana Gelê* gelek tiştên cihêreng dibêje, ku piça wê jî bi vê nameyê re li hev nake.

Ehmed di hevpeyvîna xwe de pê de diçe, dîyar dike ku piştî wefata Şêx Mehmûd Berzencî (1956) xwepêşandaneke mezin li Silêmanîyê çêdibe, di vê xwepêşandanê de jinek tê kuştin û gelek kes jî birîndar dibin. Ehmed diçe Kerkûkê û li wir tê girtin. Lewma ev hedîse û bûyer ji bo wî dibin fikrên bingehîn bo nivîsîna *Jana Gelê*. [Digel ku ez ji nameyê fahm dikim ku wî roman berîya wefata Şêx Mehmûd nivîsîye jî, ji ber hevpeyvînê ez tê derdixim ku wî roman piştî wefata Şêx Mehmûd nivîsîye.] Lê Îbrahîm Ehmed ji ber rejîma kevneperest rasterast nikare behsa kurd û Kurdistanê bike, lew behsa şoreşa Cezayîrê dike, mîna ku

bûyer li Cezayîrê rû dabin, û romana xwe pêşkêşî şoreşgerên Cezayîrê dike [di çapa kurmancî de ev pêşkêşî ne berdest e]. Gava ku polis davêjin ser mala wî, vê romanê jî digel wî “dîl” digirin û wenda dikin. Ehmed dike û nake romanê peyda nake û piştî demekê ji bo tedawîya xwe diçe Londonê. Li Londonê biryar dide ku ji nû vê romanê binivîse û Ehmed werê berdewam dike: “Pir ecêb e, lê min ew di nav 8-9 rojan dinivîsî, hemû romanê tamam kir. Mîna ku ez bixwînim û binivîsim... Hemû roman hate bîra min û min ew, tevî guherînên pêwîst, ji nû ve nivîsî. Û paşê bi alîkarîya kak Kemal Fuad romanê çap bû.”²¹

Vêca bi pirs û pûrsan em dikarin serî li xwe bikin tara bêjîngê û bi-bêjin, çima di derekê de halo dibêje, di derekê de jî wilo dibêje, kîjan rast e, filan û bêvan û hwd. Lê hewce nake ku em serê xwe bi van pirsan re biêşînin, çimkî rastîyek heye, ew jî ev e ku *Jana Gel* bê şik û guman di sala 1972yan de hatiye çapkirin. Digel ku ez di tu çavkanîyên dîtir de pêrgî wê nehatim ku Ehmed ev roman li Londonê, di nav 8-9 rojan de nivîsîye jî, agahdarîyên ku di hevpeyvîna xwe de dide ji yê nameyê beraqiltir in. Çimkî serlehengê romanê di xwepêşandaneke gel de birîndar dibe û tê girtin. Lewma romanê divê piştî xwepêşandana wefata Şêx Mehmûd hatibe nivîsandin, ne berîya wê. Û ji ber ku roman behsa deh salên piştî xwepêşandanê dike, bi ya me çêdibe ku wî romanê piştî deh salên xwepêşandana 1956an jî nivîsîbe, ku ev jî berawirdî 1966an dike.

V.

Îbrahîm Ehmed, navê qerekeran serê ewil veşartî dinivîse, lê di çapa 1972yan de ji bilî çend navên wekî Birînpêç “N...” (107), “M.M” (185) û “T...” (186) hemû navan rasterast dide. Di romanê de nêzî sed nav derbas dibin, lê kesên ku tê de di nav liv û tevgerekê de ne kêman in. Camêrê ku hukmê xwe li temamê romanê kiriye, temsîla nivîskar jî dike û nivîskar di profîla Camêr de hema hema bîr û boçûnên xwe nivîsîye. Lewma Îbrahîm Ehmed, heta ku jê hatiye qala başî û belengazîya wî kiriye, wekî ku bibêje hema ez jî wiha me; wî jî xwe re kiriye palpişt û nehiştîye ku qerekerêkî bi hemû alîyî ve serbixwe ava bibe. Herçend ku Wayne C. Booth di gotina xwe ya “Nivîskar bivê nevé di nav qerekerên xwedan nirxê estetîk an jî rewşenbîr û exlaqîyeta beramberî hev de jî piştgirîya layekî dikin. Hema berhemeke dera hanê jî dê derbarê qerekerêkî an jî koma qerekeran de be. Fikrên nivîskar yê li ser divêtiya wekhevîyê hema her çî bin, ne mimkun e ku bi heman tewrî pûte bi

21 *Antolojîya Edebîyata Kurdî*, r. 336.

gişan bide²².” de xwedan heq be jî, ya ku Ehmed dike ji piştgirîyê bêtir, xwe-berzîkirin û xwe-temsîlîkirin e di profîla qerekerêkî de, ku ev jî rê li ber qerekerên din digire û wan dike kaya ber bê.

Piştî Camêr, qerekerên ku behsa wan tên kirin û çalak in pismamê wî Lawe, jina wî Kalê, kurê wî Hêwayê ku tu carî nebûye, dayika wî Ecê, xwesûya wî Pîrozxan, dotmam û dergistîya wî ya berê Askol û dayika wê Fatmexan, hevrêyên wî Aso Mend, Kawe, Şaho û Nerîman in... Tehlîla qerekeran bêhtir yeklayanî ye, wate tenê behsa layekî wan tê kirin. Heke xirab be xirab e, zalim e, ser û sûretê wî pîs e, qîlafetê wî sik e. Heke baş be baş e, belengaz e, bêguneh e, bedew e, rûşêrîn e û filan. Sermeselê gava Camêr derdikeve ku ji jina xwe ya ber hemlê re li dadîkekê bigere, pêrgî Tewfîq Xireyê “*casûs*” tê, Tewfîq Xire bi “*berkeneke neşîrîn*” bi Camêr re diaxive, rastlêhatina vî kesê “*bêmeymenet û pîs*” lê giran tê û Camêr vê “*nîşanek baş*” nahesibîne (19).

Profîla ku Îbrahîm Ehmed a li ser qerekeran pêşkêşî me dike dûrî serdema xwe ye. Kalê gava ku li ber hemlê ye, dixwaze kurek ji wan re çêbe, lê Camêr di navbera keç û kuran de tu ferqekê nabîne û vê gotina jina xwe dûrî êqil û hiş dibîne. Û jê re dibêje, “*kengî bûyî kevne perest?*” (15-6) Lê helbet, wekî ku me gotî, ev ne Camêr e, ev nivîskar bi xwe ye. Û ev Camêrê ku ez behsa wî dikim du salan li ser hev di sinifê de dimîne û paşê dibistanê diterikîne (48). Kalêya ku gava li ber hemlê ye kurekî bo xwe dixwaze, berîya ku bi Camêr re bizewice, hingê 16-17 salî ye, ji Camêr kitêbên kurdî dixwaze û bi zanebûn “*şîrên evînê*” bi Camêr dide xwendin (54). Lê gava ku dîya Camêr ji Kalê dixwaze ku pêk ve biçin mala destgirtîya Camêr, Kalê dibêje ku ew hê di “*şîn*”ê de ye, ne baş e ku bikeve gerê (55). Piştî deh salan gava ku Camêr ji zindanê derdikeve, serê pêşîn ne pismamê wî Lawe û ne jî hevalê wî yê herî nêzîk wî nas dike, lê gava ku di rê de dimeşe, kevnecîranekî mala xalê wî, wî nas dike (136).

Qerekerên baş û xirab pir dişibin hev. Qerekerên baş piranî wek sîyasetmedaran diaxivin û her di derdê rizgarîya welêt de ne. Zana û nezan, gundî û bajarî, zarok û pîr, feqîr û dewlemend, karker û esnafên wan dikarin wekî hev biaxivin. Wekî ku Alan jî dibêje, roman di nav tertûbelayên civakê de serborîya karakteran dide ber xwe, lê di nav gelên ku kêşeyên wan di ber derdên kolektîf de tên bilêvkirin, roman qedera şexsî ji ya giştî cuda nake û “*nivîsandinê wek karekî kêrhatî, pêwîstîyeke kêmasîkuj dibîne.*”²³

22 Booth, Wayne C. (2012), *Kurmacanın Retoriği*, Wer. Bülent O. Doğan, Weş. Metis, Stenbol, r. 88.

23 Alan, Remezan (2013), *Folklor û Roman: Li dor texeyyulên berê rêçên îroyîn*, Weş. Peywend, Stenbol, r. 158.

VI.

Herçend Îbrahîm Ehmed dixwest ku romana wî wekî sala hatî nivîsîn, yanî 1956, bê çapkirin (195) jî, em nikarin wê wekî romana 1956an qebûl bikin û lewma jî di soranî de ne romana yekem e jî. Li Kurdistanê Îraqê tu pexşanên Îbrahîm Ehmed bi qandî *Jana Gel* û kurteçîrokên wî hêjayî behs û pesindayîne nehatiye²⁴.

Em ber bi dawîya romanê ve pêrgî pênasekirineke giştî ya li ser “jana gel” tîn. Camêr hinga ku ji alîyê pêşmergeyan ve tê desteserkirin bi saya hevalê xwe Nerîman, ku di nav wan de yekî naskirî ye, xilas dibe. Hingê Nerîman wiha pê de diçe: “Şoreş jana gel e. Navê janê bi xwe li ser janê ye, çî ya jinan be, çî jî ya gel. Ji ber vê, ne tiştê ecêb e, ku jana gelekî pir derd, ezîyet xwêdan, rondik û xwîn be, ev wiha ye. Lê gelo tu şik di wê de heye ku hatina dinê ya neteweyeke aza yê serbilindê bextewar, janeke ji wê hê ezîyet û nexweştir bi xwe re tîne (r. 172).” Ji min re wek vegotina qerekerê jankêş û belengaz hat ku dilê wî ji dinyayê reş bûye, xwe ji hemû dar û dîwaran kiriye, ne tehmekê ji xwarinan û ne jî kêfekê ji mirovan dike, lewma şoreş û serkeftin û berxwedanê wekî jan û êş û kul û derd û kelem û dinyak xwedê tişt hesêb dike, tew ev ne bes e û jana xwe li hemû gelê xwe bar dike û wekî ku dîyar bike, a rast, jana ku dikêşe ne tenê bo xwe ye, bo gelê xwe giştî ye²⁵.

Ji bilî vê di romanê de dinyak xwedê peyvên wekî jan û arihan û êş û kul û keder û ezîyet û filan û bêvan derbas dibin. Sermeselê Ehmed gotîye, “Nav û navan re jî bêdengîyeke bi *elem* (14)”, “Piştî ev qas *ezîyet* û *janê* ji me re keçek çêbe (15)”, “Lê cardin ew *ezîyetên* çareya wan ji *kul* û *derdan* tije (17)”, “Baş e, de bixwe, xwe bigevizîne û *jan* bikêşe (17)”, “bi berkenîneke *êş* û *elem* ve (27)”, “bi dengê gelek *kul* û *xem* (27)”, “*êş* û *arihanek* bi *ezîyet* di laşê wî de hat xwarê (28)”, “Ew *derd*, *elem*, *êş* û *ezîyeta* bêheq û bêsebeb bi ser min û mal û zarokên min de anîn (76)” û hwd. (*yên îtalîk ên min in*). Û Ehmed vê janê hingî berz û pîroz dike, ez jî li ber bayê wî diçim.

24 Hassanpour, Amir (2005), *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil*, Wer. İbrahim Bingöl-Cemil Gündoğan, Weş. Avesta, Stenbol, r. 611-2.

25 Bi raya min hêja ye ku rojekê li ser navên wekî jan û êş û kul û keser û hwd. yê nivîskar û hunermendên kurd tezek an jî kitêbek bê nivîsandin, ku bi têra xwe navên reşbîn û xemgîn û dilodîn û terkedinyatî û belengazîyê ne. Ecêb e lê min divê bibêjim ku navê “jan” vê dawîyê tesîreke mezin li ciwanên me kir û êdî navên curbicur yê bi vî awayî li xwe dikin. Hêjayî gotinê ye ku ez behsa Jan Jîndarê Mehmet Şarman jî bikim, ku qerekerê çîroka wî ya “Axaftina Nobelê” ye, ku bi vî nav û qerekerî rexne û mîzaheke xurt li dora nivîskarên kurd digêrîne. Bnr. Mehmet Şarman (2010), *Pirça Winda*, Weş. Avesta, Stenbol.

Ev romana ku li ser gelek monologan û *flashback*ê ava bûye, pirî caran bi vebêj re tevlihev dibe û carina nivîskar û vebêj ji hev nayê derxistin. Roman qala bûyerên deh salan dike. Roman li ser du çiqan ava bûye, çîqa ewil û rastîn ev e ku, Camêr piştî deh salan ji zindanê derdikeve û deng û behsên jê û pê ve; çîqa duyem jî, ku bi *flashback*an saz bûye, behsa bûyerên deh sal berê dike ku hingê Camêr tê girtin. Camêr piştî deh salan ji zindanê derdikeve û vedigere bajarê xwe “Ç...”yê. Bi carekê re jîyana wî weke şirîteke sînemayê di ber çavê wî re derbas dibe û li deh salên xwe yên berê vedigere. Jina wî Kalê bi heml e, Camêr jî derdikeve derve da ku dapîrokekê bo jina xwe bîne. Camêr di ber devê Serayê re jî diçe, hingê xwepêşandanek jî li heman cîyî heye ku ji aliyê serokatîya Partîya Rizgarî ve pêk hatiye. De tu were li vî telebextê reş binêre, îjarê şer di navbera gel û cendirmeyan de derdikeve û çend gulle jî li Camêr dikevin. (Nivîskar di vir û beşên din de dîsa vedigere çîqa ewil, carinan yekcarî diçe û qala hevnasîna xwe û jina xwe dike. Encax di beşên 9. û 10. [97-122] de em hay jê dibin bê ka Camêr çî kir.) Camêr bi serokatîyê tê sûcdarkirin û “ji bo ku Camêr di dema xwenîşandanê de hatibû birîndarkirin, wî yek ji wan serokê tevgerê yê mezin hesibandibûn û ew di hucreyê yekkesî de digirtin (36).” Hey ku Camêr xwe li erdê dixwe, xwe diingirîne û dibêje na, ne rast e filan jî, cezayekî “pir giran” ku hêjayî serokan e, bi qasî deh salan lê ferman dîkin û wî dixin zindanê. Di vê hîne re gelek tişt diqewimin. Herçend ku em ê ber bi dawîya romanê fahm bikin jî, pismamê Camêr ê bi navê Lawe di nav deh salan de, da ku jana Camêr zêdetir nebe jê re derewan dike û her qala başîya siheta jina wî û kurê wî Hêwa dike.

Ez vegerim ser çîqa duyem. Camêr dike ku biçe mala xwe, lê tê bîra wî ku Lawe di nameyê xwe de nivîsibû ku kulfeta wî anîye cem xwe û xanîyê wî jî daye kirê. Camêr gava ku diçe mala Lawe dibihîse ku Kalê û Hêwa çûne gund, mala xaltîya xwe. Werhasil çend beş wisa çem û çem diçin û Lawe her carê mahneyekê ji xwe re dibîne û Camêr dixapîne. Camêr hevalê xwe yê herî nêzîk Aso Mendî dibîne û êvarê li mala Kawe digel hevalên berê dicivin. Rojên wî bi acizî dibuhurin û diçe mala xizm û merivên xwe, ji wir jî lê dixwe diçe cîyê mala xwe ya berê, lê çî fêde ji kavil û xirbeyî pê ve tiştêkî nabîne. Piştî Camêr dikeve qirika Lawe û dibêjîyê ku te çima negote min filan, ew jî dibêje, dev ji van tiştan berde, û Lawe berze dibe. Camêr biryara çûyîna gundê Golan dide, bi rê dikeve, li gundekî bêhna xwe vedide, gund tê bombabarankirin. Camêr piştî bombabarane dîsa bi rê dikeve, lê pêşmerge bi tawanbarîya casûsiyê wî digirin û li gel xwe dibin û di vê hîne re ji pêşmergeyan hîn dibe ku

gundê Golan jî hatîye bombebarankirin û kesek jê sax nefilitîye. Paşê bi xêra hevalê Camêr ê bi navê Nerîman tespît dikin ku ew ne casûs e. Camêr dîsa vedigere mala Lawe, ‘eraseya malê difiroşe û biryar dide ku cîyê xwe biguherîne. Piştî mehekê nameyek ji Camêr bo Lawe tê, tê de dibêje ku tevî refên pêşmergeyan bûye. Lawe jî nameyek bo Camêr verê dike û tê de behs dike ku wî bi xwe derewan jê re kiriye, Kalê li ser hemla xwe mirîye û zarokekî bi navê Hêwa jî çênebûye. Roman bi vî awayî diqede û Camêr ewqas digirî, ewqas digirî, heta ku nameyê gişî bi rondikên xwe ter dike (194).

VII.

Wekî ku min di serî de jî got, zemanê vê romanê bi sala mirina Şêx Mehmûd ve girêdayî ye. Lewma bi raya min, ku bi ya min rast e jî, zemanê vê romanê bi xwepêşandana piştî mirina Şêx Mehmûd, yanî ji sala 1956an ve dest pê dike heta 1966an didome. Lê min divê bi bîr bînim jî ku Ahmedzade vê wekî salên 1945-1955an destnîşan dike²⁶. Herçend Ehmed navê bajêr rasterast nade jî, dê ne texmîneke zor be ku ez bibêjim ev bajar Silêmanî ye, lew nivîskar wekî di hevpeyvîna xwe de jî dîyar kiriye, piştî wefata Şêx Mehmûd xwepêşandanek li Silêmanîyê çêdibe û ev xwepêşandan bi xwe dibe serekaniyek bo nivîsandina romana wî. Camêr di beşa ewil de, bi *flashbackê* gava li rojên berhemlebûna jina xwe vedigere, “xaniyekî biçûk li taxa “S...”yê li bajarê “Ç...”yê di odeyeke sade (r. 14)” tîne bîra xwe. Ev ne agahdariyeke tam û temam be jî, çêdibe ku Îbrahîm Ehmed bi qestî navê bajêr û navê taxê guherandibe, ku hingê “S...” (Silêmanî?) dibe bajar û “Ç...” jî dibe tax. Ma dê Îbrahîm Ehmed ji bo çi tiştêkî wisa bike? Helbet ji ber ku nikarîbû rasterast behsa navên bajarên kurdan bikira, lewma di destpêkê de heta ku jê hat veşartî nivîsî, piştî jî hema bêje tenê navên şexsan wekî kurdî pêşkêş kirin.

Di romanê de agahîyên li ser zemên gelekî qels in û roman her ku teqlan dide xwe bi rojan û wextekî çawalêhato dipeyive; piştî çend rojan, sibehê, roja din, piştî çend mehan, çend sal berê û hwd. li dora hev dizivire. Di beşa ewil de, gava ku Camêr bi *flashbackê* li deh sal berê vedigere, bi “dem wextê êvarê bû, li asîmanê aloz û tarî yê payîzê (14)” tê fahmkirin ku payîz e. Di romanê de ji bilî navên gundê wekî Golan (r. 147) û Navdolan (r. 164) navê hemû mekanan veşartî hatîye nivîsîn. Her wekî, “Min û Mîran Qadirê Ciwanemerg li bajarê ‘...’ me bi hev re

dixwend (r. 89)”, “ez bi bavê xwe re bi maltî çûm bajarê ‘M’yê. Piştî demekê, em rastî mirovekî baş hatin, bavê min li ba xwe û min jî li kompanya ‘C’yê de bi cih kir (r. 126)”, “Mala birayê wê jî ku niha li bajarê ‘K...’yê ye (r. 135)”, “Çûye bajarê ‘H...’yê (r. 143)”...

Ziman bi devê kesê sêyem tê gotin, vebêj bi awirtêdaneke giştî li bûyeran mêze dike û hay ji hiş û binhişê qerekeran heye û vê yekê bi zelalî jî dide nîşan. Monologên dirêj û ku gelek caran belaheq tên kirin, piraniya romanê digire nava xwe. Ji bilî monologên Camêr, monologeke diya Camêr jî di rûpelên 56-57an de heye.

Ev romana ku ji kana sîyasetê zaye, ku li ser bûyereke rastîn ava bûye, nekarîye bi zêdegavî behsa *netewe* (kurd), *zimanê neteweyê* (kurdî) û *mekanê neteweyê* (Kurdistan) bike. Lewma di çend deran de behsa van xalan çêbûye. Camêr pismamê xwe Lawe kurdekî ji rêzê û sade dihesibîne, lê xwe wekî yekî sîyasî (183-4). Camêr hinga ku ji layê pêşmergeyan ve tê girtin, yek ji wan dibêje, “Dibêjin Kurd bide xeberdan, şirovekirina xwe bi xwe dike (159)”, lê Camêr dibêje wan ku ew nû ji zindanê derketiye û li ser kurdîtiyê hatiye girtin (159). Kalê berîya ku bi Camêr re bizewice, ku hingê 16-17 salî ye, ji Camêr daxwaza pirtûkên kurdî dike, çimkî ji bilî kurdî bi tu zimanî nizane û Camêr jê re diwanên Nalî, Salim û Nehwî tîne (54). Camêr di monologa xwe de, dema ku Nerîman wî xilas dike, dibêje, “Nerîman dê çi bizane Hêwa û Kalê kî ne? Ew ji ku min nas dike, ew hê zarokê do ye. Dema ku min Kurdîti dikir, mimkun e ew hê di sinifa sisêyan, an çaran a dibistana destpêkî de bû (169).” Adorno dibêje, “Rabirdûya berdest ji bo me hemîşe fenaî kavilekî bermahîya karesatan dixuye²⁷.” Ji lewma ye, gundên Kurdistanê di nav deh salan de li ber çavên Camêr gelek diguherin (146). Li gor Camêr, gelek meqamên kilamên tirkî ji yên kurdî hatine wergirtin, her wekî çawan ji xelkê Kurdistanê re “Tirkên Çiyayî” dibêjin, ji kila-man re jî “şerqî”yên Tirkî dibêjin (77).

VIII.

Çend kil û kêmasîyên dera hanê. Camêrê ku bi tesadûfî di ber xwepêşandanê re dibuhure û tu pêwendîya wî jî pê re nîn e, ji layê cendirmeyan ve tê birîndarkirin û ji aliyê hikûmetê ve wekî serokê tevger û xwepêşandanê tê sûcdarkirin (36); her kes dibêje qey berra “Camêrê belengaz” wisa ye, Lawe dibêjîyê “te di riya welêt de dest jiyana xwe

27 Adorno, Theodor W. (2012), *Minima Moralia*, Wer. Orhan Koçak-Ahmet Doğukan, Weş. Metis, Stenbol, r. 53.

berdaye, zindan dîtiye û bi salan te ji mal û zarokên te dûr xistine (31)”; gava ku mehkûmekî bi navê Bêbak Sabir dibin hucreya Camêr, ew kes dibêje Camêr, “tu ew kesî ku dibêjin di xwenîşandana Teşrînê de êrîşê ser daîreya polîsan kiriye (118); tew hevalên wî yên herî nêzîk jî bawerîya xwe pê nayînin ku berra ew ne serokê tevger û xwepêşandanê ye û dibêjinê ku “ma kî heye ku behsa azayetî, qehremanîya te û yên derûdora te seh nekiribe, tew xelkê ev yek li ser te kir kilam û şîr û gotin (98)”. Tiştê ku Îbrahîm Ehmed li vir dike dûrî aqilan û aqilê şexsên din e, dibê qey zabit û hikûmet û heval û derdor hemû ehmeq in, tenê Camêr baqil e, yên din saf in, lewma çênabe ku tesadûfek di vir de hebe.

Dîya Camêr, Ecê, di rûpela 52yan de ji Kalê re dibêje “Bi serê Camêr, qasî ez ji te hez dikim, ez ji keçên xwe hez nakim”, lê hema di rûpela piştê de, nivîskar xwe ji bîr dike û dîyar dike ku tu xwişkeke Camêr nîn e û ji bilî dayîka xwe tu jinê jî nedîtîye (53). Camêr gava ku ji hevalên xwe re qala girtina xwe dike, dibêje ku cezayê herî giran, deh sal, ku wê demê girantirîn ceza ye dane min (99); le hema piştî çend rûpelan nivîskar dîsa xwe ji bîr dike û bi devê Camêr dibêje, “Gelek kes hene bi awayekî spasî pazdeh bîst sal hikum qebûl dikin (102).” Ev tişt jî vebêjîyê tahmsarkî dikin, herçend ku em bibêjin ev roman bermayîya 8-9 rojan e jî. Ji ber hindê ev balpêdan û girîngîya nivîskêr a li hemberî kurdî jî aşkere dike.

Gava ku Camêr diçe mala Kawe, hevalên wî jê dixwazin ku qala serpêhatîya xwe bike. Ehmed di navbera rûpelên 98-122yan de tenê behsa xwepêşandan, birîndarî û girtina xwe ya heta dadgehê dike. Nivîskar di van rûpelan de çî qewimîbe, bi hûrgilî, bi kitekit, bi dîyalog û axaftinan, wekî ku bûyer niha qewimîbin, bêyî ku ji bîr bike, bilikume, asê bibe, rasterast dibêje. Di van rûpelan de agahdarîyên zêde û belahêq dinyak xwedê ne. Meriv ecêbmayî dimîne ku bê ka çawa dikare evçend tiştan rasterast bibêje. Heke ev serpêhatîya dirêj bi *flashbackê* ve bihataya gotin jî ser çavan, lê na, nivîskar wê kêlîyê çî qewimîbe, çîya û newal, deşt û kendal dibêje. Ê ez jî ji xwe re dimînin heyran û hejmezar û ez dibêjime xwe, “law evçend nivîskarekî gewre ye, dikare her tiştî bê him û gum bîne bîra xwe.” Herwiha Camêr helbesteke şeşristeyî ji devê Bêbak Sabir dibêje, ku deh sal berê gotîye (121).

IX.

Piştî ewçend kêmasîyan normal e ku hin kes xwe bixeyidînin û bibêjin, “bes lêxe, zilam mir”, “me go lêxe, me nego bikuje”, “te kil nekir, te kor kir” û filan û bêvan. Helbet, ew jî ji ersê heta fersê rast dibêjin. Çen-

dek roman hene ku meriv tenê û tenê ji bo zimanê wê dixwîne. Çendek roman hene ku meriv ji ber qedîmbûna wê dixwîne. Çendek roman jî hene ku yê ewil in û hewce ye ku meriv bixwîne. Aha *Jana Gel* jî yek ji wan e û digel hemû kil û kêmasîyên xwe, hêjayî vekolîn û dahûranê ye. Lew, ew ya me ye, bi kurdî ye û mîrateke berz û bilind e bo paşewextîyan.

Îbrahîm Ehmedê sîyasetmedar û nivîskar, ku bi her awayî bi erkeke neteweyî rabûye, edebîyatê beramberî sîyasetê hesêb kiriye, lewma timî nasnameya xwe ya edebî û sîyasî tevî hev kiriye û tu sînorekî ranekişandîye navbera wan. Çimkî bi ya wî edebîyat jî divê nola sîyasetê di xizmeta gel de be.

Wekî ku ji *Jana Gel* jî tê fahmkirin, nivîskar xwe ji vebêjîyeke belengaz rizgar nekiriye, ku tim û dayîm janê ji bo gelê xwe dikşîne, têdikoşe. Di vê romanê de ez bi ser tu nîşaneke berxwedêriya bindestîyê ve nehatim; hema şoreşgerên wan jî qala belengazîya gelê xwe dikin, ew gel mazlûm e, jar e, perîşan e, qir û qelah li wan ketîye, derbeder bûne, bêzîrar in, nizanin bi pey doza xwe kevin û hwd... Wekî encam jî, ez dikarim tespîta Clémence Scalbert-Yücel a bo edebîyata kurmançî ya hevçerx gotî, rasterast bo *Jana Gel* jî bibêjim, ku ji edebîyata soranî ye: “Edebîyata kurmançî ya hevçerx gelek bi asayî dikeve nav pola edebîyata berxwedanê: nivîserên milîtan an çalak û edebîyateke dilsozê dozê, ku piştgirîya tevgera neteweyî ya kurd an jî, bi gotineke berfirehtir, ya gelê kurd dikin²⁸.”

Çirîya Paşîn 2014, Mêrdîn

28 SCHALBERT-YÜCEL Clémence, “Paratekst û Berxwedan di Pênaseya Edebîyata Kurmançî ya li Tirkîyeyê”, Wer. Ergin Öpengin, di nav de: *Tîr û Armanç*, amad. Remezan Alan-Ergin Öpengin, Weş. Peywend, Stenbol, 2014, r. 71.

ÇAVKANÎ

ADORNO Theodor W. (2012), *Minima Moralia*, Wer. Orhan Koçak-Ahmet Doğukan, Weş. Metis, Stenbol, r. 53.

AHMEDZADE Haşim (2004), *Ulus ve Roman*, Wer. Azad Zana Gündoğan, Weş. Pêri, Stenbol.

_____ (2011), “Di romana kurdî de nişaneyên bêdewlet-bûnê”, *Romana Kurdî û Nasname*, Wer. Fahrîye Adsay, Weş. Avesta, Stenbol.

ALAN Remezan (2013), *Folklor û Roman: Li dor texeyyulên berê rêçên îroyîn*, Weş. Peywend, Stenbol.

BOOTH Wayne C. (2012), *Kurmacanın Retoriği*, Wer. Bülent O. Doğan, Weş. Metis, Stenbol.

EHMED İbrahîm (2008), “Pêşgotin”, *Janî Gel*, Tîpguh. Zana Sebrî, Weş. Komal, Stenbol.

HASSANPOUR Amir (2005), *Kürdistan’da Milliyetçilik ve Dil*, Wer. İbrahim Bingöl-Cemil Gündoğan, Weş. Avesta, Stenbol.

HUSEYN Feqî (2001), “İbrahîm Ehmed”, *Jîyana Rewşen*, hj. 50.

JUSDANİS Gregory (1998), *Gecikmiş Modernlik ve Estetik Kültür*, Wer. Tunçay Birkan, Weş. Metis, Stenbol.

LUKACS Georg (2013), *Roman Kuramı*, Weş. Metis, Wer. Cem Soydemir, Stenbol.

PARILTI Abidin- GALİP Özlem (2010), “İbrahîm Ehmed”, *Kürt Romanı Okuma Klavuzu*, Weş. Sel, Stenbol.

SERFIRAZ M. -YEŞİLMEN D.- KURT Ş. (2014), “Bi Remezan Alan re li ser Sînorên Wêjeya Kurdî Hevpeyvîn”, *Wêje û Rexne*, hej. 3.

SCHALBERT-YÜCEL Clémence (2014), “Paratekst û Berxwedan di Pênaseya Edebîyata Kurmancî ya li Tirkîyeyê”, Wer. Ergin Öpengin, di nav de: *Tîr û Armanç*, amad. Remezan Alan-Ergin Öpengin, Weş. Peywend, Stenbol.

ŞARMAN Mehmet (2010), *Pirça Winda*, Weş. Avesta, Stenbol.

UZUN Mehmed (1995), *Antolojîya Edebîyata Kurdî*, Weş. Tüm Zamanlar, Stenbol.

YUSIV Helîm (2011), *Romana Kurdî*, Weş. Ronahî, Dîyarbekir.